Ezimk

Şengo û Zifto û dotmama wan

Maleka veder, xêzaneka bextiyar, xweşbextiyê şaperên xwe bi ser dadane, ev e xêzaneka akinciyê bajarê me ye û hejmara wan hindî rojên heftiyê ye, her dema mirov dibe mêvanê vê malê ji nû ve mirov hest bi bextewerî, şadî û xweşiya jiyanê dike, keç diya xwe mîna du hevalên pir nêzîk suhbetan dikin. Bab di gel kurên xwe, mîna du hevsozan derdedil û suhbetan dikin û hemû tev de mîna balindeyên refeka nejiyekqetiyayî fir didin û her cihê bi ser de di gerin mîna baxçekî kesk ron dikin.

Tiştê balkêş di nav vê xêzanê de, viyana wanan bo giyaneweran. Li vê malê û di vê xêzanê de du pişîk hene(şengo, Zifto). Ez dikarim bibêjim herdu mîna du zarokên wan in di malê de.

Û her yek ji aliyê xwe ve çavdêrî û newazeşa wan dike. Ji ber vê viyanê, şengo û Zifto jî mîna du zarokên guhdar û neşûm guhdariya wan dikin. Heger carekê endamekî vê xêzanê bibêje şengo yan Zifto, here ji derve, dê kuriya xwe hejîne û hêdî rêka ji derve digire û heger carekê mêvan bo vê xêzanê hatin û zarok di gel wan de bin, şengo û Zifto qesta ji derve dikin heya ku mêvan bi dilxweşî ber bi mal ve biçin.

Dema ku ev xêzan e goştî dixun, hestiyan na verojin û hindek goştî dihêlin pêve ji ber şengoyî û Ziftoyî, da ku hest bi havîbûnê nekin.

Piştî ez ji vê malê derketîm li ser riya xwe min pişîkek dît ku cihê daxêbû bi sê lingan bi rêve diçû, lingê çarê hatbû şikandin û birsî û lawaz bûbû. Mixabin ew jî dotmama şengo û Ziftoy bû. Piştî min ev dîmen e dîtî yekser axavtina kak "Behcet Hirorî" sernivîskarê heftînameya EVRO hate bîra min dema ku carekê bi şeweyê pêkenîn gotî: Heker tu sehkî wan seyên-kûçikli derdorên bajarê Dihokê, hemû bi sê lingan e.

Salih Xazî